



**Dayik û bav û berpirsên zarokan yê rêzdar,  
ji ber biriyarnameya hukumeta herêma Niedersachsenê ya niha em  
divê bala we bikşînin li ser van şert û mercên jêrîn:**

### **Rêbazên serdanê yê bingeîn**

Serê her nexweşekî çêdibe ku kesekî din bi tenê bi wî re were hembêz  
kirin û divê ew kes li dema amadebûna xwe di nexweşxanê de rêzê li  
tedbîrên parastinê bigire.

Çêdibe ku dayik yan bav yan berpirsê zarok yê din jî were serdanê, lê  
hema divê serê her nexweşekî kesekî bi tenê li odeyê de amade be.  
Dayik û bav dikarin bi vî awayî bi dor li ba zaroka xwe bimînin. Ji bo  
nexweşên beşên guhdana berdewam û beşên zarokên nû çêbûyî dê  
çareyeke taybet bo wan kesan peyda bikin.

**Serdana ji aliyê kesên din ve wek dapîr û bapîran yan xwîşik û  
birayan hîn wekî berê ne mumkin e.**

### **Li dema hatinê**

Li dergê serek de rêyeke taybet ji bo kesên ku têne hundir û yek ji bo  
kesên ku derdikevin hatiye amadekirin. Li dema gehîştina te li ber derî,  
dê pirsnameyekê radestî te bikin. Ji kerema xwe re nav û nîşana xwe û  
dem û saeta ku tu derbasî nava nexweşxaneyê dibî, tê de binivîse. Tu di  
heman wext de piştrast dikî, ku tu diyardeyên nexweşiyê li te nîn in û ku  
tu di van herdu heftiyên derbasbûyî de danûstandinên te bi mirovên, ku  
bi nexweşiya (SARS-Cov-2) ketine, nebûn.

**Ji kerema xwe re bila ew pirsname li ba te bimîne!**

Piştî ku te navê xwe li ba ambulansê yan li navenda pêşwazîkirinê qeyd  
kir, ji kerema xwe re yekser rastûrast here wî beşê nexweşxanê, ku te  
qesta wî kiriye û li destpêkê nivîsîngeha wî beşê derbarê hatina xwe  
agahdar bike.

## **Li dema derketina ji nexweşxanê**

Li dema ku tu ji nexweşxanê derdikevî, divê tu dîsa roj û saetê di wê pirsnameyê de binivîsî. Piştî hingî dema tu derdikevî wê pirsnameyê li wan vegerîne. Ew agahdariyên hatîne nivîsîn dê ji bo şopandineke muhtemel û pêdivî ya zincîra pêketînen nexweşiyê ji bo çar heftiyên were tomar kirin û piştî hingî dê were tune kirin. Em ji aliyê qanûnî ve pabendî vî erkî ne.

## **Erkê bikaranîna maskê**

Hemî kesên serlêder divê di hundirê nexweşxanê de maskê bikarbînin. Lê li dema ku mirov di odê de li ba zaroka xwe be û bi kêmanî 1,5 mîtro ji kesên din dûr be, hêdî ne pêdivî ye, ku mirov maskê bikarbîne. Li dema razanê mask ji kesekî re ne lazim e. Mirov dikare maskên qûmaşî jî bikarbîne., heger paqij bin û ne şil bin û têra girtina dev û bêvilê bikin. Destmal û stûmal çênabin.

## **Rêbazên paqijiyê yê bingehîn**

Ji kerema xwe re li dema derbasbûna nava nexweşxanê û derketina ji wê her dem destên xwe baş bi derman paqij bikin. Ji kerema xwe re bi kêmanî 1,5 mîtro ji hev dûr bin. Çênabe ku mirov lepikên destan yê taybet bi xwe bikarbîne, ji ber ku hingî mirov wê nikaribe destên xwe bi rêk û pêk bi derman bişoye. Divê herdem mirov rêbazê kuxîn û pişkîne pêk bîne (di zendika xwe de).